Ji Penûsê Jinê Rastîya Jîyanê

RAPERÎN

Dîrok: Îlon 2024 Hejmar:13 Biha: 1000

ROJEV 2 — Em ê Ji bo Azadîyê Rêxistin Bibin, Şer Bikin

NEZERÎ 3 — Em Ji Dîrokê Hêz Bigirin Li Hemberî Serdestîya Mêr Têbikoşîn

DÎROK 4 — Di Şoreşa Kubayê da Jin

Em ê Ji Bo Azadîyê Rêxistin Bibin, Şer Bikin



Pergala kapîtalîst a serdestîya mêr her ku diçe ji bo jinan dizivire rewşeka hîna xofdar. Li Bajarê Kalkûta yê girêdayî Hîndîstanê jineka bijîşk ji alîyê mêrên ku li nexweşxaneyê dixebitîyan rastî destdirêjîyê hat û hat qetilkirin. Li Hîndîstanê û çar alîyê cîhanê bi deh hezaran jin li dijî ev êrîşa destdirêjîyê bi dirûşmeya "Jin Jîyan Azadî" ketin tevgerê.

Li Iraqê zagona ku temenê zewaca jinan ji 15ê were daxistin 9 di rojevê da ye. Teva vê; ligel ku ev zagon mafa zewaca ji olên cuda dide mêr, lê heman mafê nade jinê. Li gorî ev zagona ku eydî sala 1959an e, berdana kesên zewicî li gorî hiqûqa medenî-şarezayê dihê kirin, dê bi vê zagonê karibe berdanên li gorî ola Sunî û Şîî were pêkanîn. Ger ku di wateya fiqhi da oleka jinê tune ye, dê berdan an jî mafên ku werin bidestxistin li gorî ola hevjînê wê were kirin. Yanê hem temenê zewacê dihê daxistin û di heman demê da mafên jinê yên ku di zagona medenî da hatine bidestxistin dihên tunekirin û vedigere berî 1959an.

Li Şengalê fermana 74emîn a ku di 3ê Tebaxa 2014an da destpê kirîye hîna di merîyetê da ye. li Şengala ku ji DAÎŞê hatîye rizgarkirin niha bi destê istixbarata PDKê ya bi navê parastin û istixbarata Tirk jinên ciwan dihên revandin, dihên kirin misilman. Aqûbeta bi hezaran zarok, 3.504 jin û 869 mêr Êzidî yên ku ji alîyê DAÎŞê ve hatine revandin hîna de dîyar e.

Li Rojhilatê Kurdistanê û Îranê berxwedana ku bi dirûşmeya "Jin Jîyan Azadî" ya ku di 16ê Îlona 2022an da piştî hatin qetilkirina jina ciwan Jîna Emînî, destpê kir berdewam e. Bi sedan jinên ku pêşengên jinan û gel bûn, hatin girtin. Hikûmetê Îranê herî dawî cezayê darvekirinê da Şerîfe Muhemedî û rojnamevena şoreşger Pexşan Ezîzî.

Dewleta Îsraîl a dagirker êrîşî Başûrê Filîstîn û herêmên li ser sînorê Misirê ku berê weke herêmên biewle îlan kiribû dike. Êrîşên li ser dibistan, nexweşxaneyan bênavber berdewam in. Niha li Şerîaya Rojava, Xeza û Qudsa Rojhilat bi hejmareka mezin jin, zarok, mêr hatin dîlgirtin. Di zindanên dewleta dagirker da sîyaseta şkenceya biserûber heye. Wiha ye ku Îsraîl dema ku leşgerên dagirker ku bi awayekî komî destdirêjîya zarokekî/ê dikin wan bi gotina "ew karê xwe dikin" diparêze.

Li Efxanîstanê bi "zagona fezîlet" ya ku nû hatîye derxistin dê li ser jinan tadeya dewleta mêr were zêdekirin. Dê bi polîsên exlaqê jin were xistin kontroleka berdewamî.

Li Bakurê Kurdistan û Tirkîye êrîşên li ser jinan bênavber berdewam dikin. Ji bo jinan zagonên ku berdanê hîna zehmettir dikin hatin amadekirin. Bi van zagonan dihê xwestin ku jin werin mehkûmî zewacên ne bidil kirin. Zagona bikaranîna paşnavê xwe ya jinan dihê guhertin. Şefê faşîst Erdogan, dixwaze paradîgmaya xwe ya "yek ziman, yek al, yek netew" bi malbata şêweya şefîtî misoger bike. Jîyana biwurşe-şatafat, xanî, cil, erebeyên wurşedar ên di rêzefîlman da giştî derew in. Li Tirkîye jin di nav xizantîyeka kûr da ne. Bi taybet hejmara jinên ciwan ên ku bi firotina bedena xwe hewldana derxistina mesrûfê xwe yê dibistanê didin, her ku diçe zêde dibe. Rizîn û dejenerebûneka xofdar heye. Û ev herî zêde bandorê li jinan dike. Ji ber ku di van şertan da rastîya mêrê hov adeta ji nû ve zindî dibe.

PDKê ya ku her diçe di xeta xiyanetê da kûr dibe, bi dewleta Tirk a mêtingehkar ra li dijî gerîlayên ku li çîyayan, jîyana azad û wekhev ava dikin şer dan destpêkirin. Çîya û gundên Kurdistanê dihên bombebarankirin. Gund bi zorê dihên valakirin. Leşgerên Tirk û çete di van deran da dihên bicihkirin. Li çar parçeyê Kurdistanê jin baş dizanin ku ev leşger û çete li dijî jinan sûcên bi çi rengî pêk tînin. Dewleta Tirk a mêtingehkar û hevkarên wan ji bo tesfîyekirina şoreşa me ya Rojava êrîşên xwe yên leşgerî, sîyasî, aborî, bîrdozîyî û çandî bênavber berdewam dikin. Niha jî ji bo ,ji du alîyan ve perçiqandina şoreşa Rojava, dixwaze rejîma Surî qanah bike.

Hemû Jin Li Dijî Tevahî Êrîşan û Pergala Baviksalar û Mêtingehkar Berê Xwe Bidin Berxwedanê

Li dijî ev êrîşên neteweyî, cinsî û çînayetî yên ku li dijî jinan her ku diçe zêde dibin elbet jin serî natewînin, bîat nakin. Serê wan biçe dara darvekirinê jî berxwedan û şerê xwe berdewam dikin. Dirûşmeya "Jin Jîyan Azadî" ya ku li Rojhilat destpê kir û belavî Îranê û ji wir belavî cîhanê bû jinan dixe tevgerê. Piştgirîya jinê mezin dibe. Jin êdî naxwazin di ev pergala serdestîya mêr a hov û zordest da bijîn. Jîyana koledarî red dikin. Lê tevahî daneyên li herêm û cîhanê nîşan didin ku jin tena bi serê xwe nikarin azad bibin, nikarin azad bijîn. Ji ber ku serdestîya mêr hatîye rewşeka dewletbûnî. Û heta ku bingeh û siwana wê nayê hilweşandin jin nikarin rizgar bibin. Li dijî me pergaleka baviksalar ku xwedî tecrûbeya hezar salan heye. Li dijî me hêzeka rêxistinkirî ku bi artêş, polîs, mahkeme, ol û pergala xwe ya çandî heta asta dawî bûye dewlet heye. Wê demê divê rêxistinbûna jinan jî xurt bibe.

Şoreşa me ya Rojava-Bakur û Rojhilatê Sûrîye ya demokratîk, xweser û azadîxwezîya jin ji bo jinan rêya rizgarîyê vekir. Encax em dizanin ku heta ku li Sûrîye pergaleka demokratîk-şoreşger pêş nekeve, heta ku dewleta Tirk a mêtingehkar nayê hilweşandin em nikarin di rêya rizgarîyê da pêş ve biçin. Ji ber vê yekê dema ku em jinên Rojavayî yên Kurd, Ereb, Suryan, Ermen, Tirkmen û HWD. derfetên jîyana azad û wekhev ku şoreşa Rojava derxistina holê, di her şaneya jîyanê da ava dikin, di alîyê din da divê em li dijî dewletên paşverû yên herêmê şer bikin. Ji ber ku bêyî ku em şer nekin em nikarin tu mafan bi dest bixin. Li Rojava bi sedan jinan di sengerên şer da şer kirin, vîna jinan a şer ji hemû cîhanê ra bû mînak. Divê niha jî em bi heman biryardarîyê şer bikin, amadekarîya şer bikin. Bi taybetî divê jinên ciwan bi xwestekeka hîna mezintir di nav şerê çekdarî da wesfên xwe bi pêş bixe û fêrî şerkirinê bibe.

Marksîst Lenînîst îsal sala xwe ya 30emîn diqedînin. Em damezrana Partîyê Marksîst Lenînîst Komunîst ku di hemêza xwe da jinên wekî Berçem, Ekin, Sarya, Şevîn, Îvana, Roza, Destan, Raperîn, Berfo, İsyan û Zîlan pêşxistin silav dikin. Em weke beşa fidayî ya şoreşa Rojava ya jin ji dost û dijminên xwe ra careka din îlan dikin ku em ê şerê xwe berdewam bikin.

Em Heval Berwar, heval Gulistan Tara, heval Hêro Bahadîn, heval Dîrok û heval Agirî yên ku di heyama dawî da, di êrîşên dewleta Tirk a mêtingehkar da şehîd ketin bi bîr tînin û careka din soz didin şehîdên xwe, ku em di her qadê da şerê xwe yê ji bo şoreşa jinê berdewam bikin, em ê rêxistinbûna xwe mezin bikin.

Em Ji Dîrokê Hêz Bigirin Li Hemberî Serdestîya Mêr Têbikoşîn

Me dîrokeka bi berxwedan û qehremantî ava kir. Şoreşa Rojava ya ku bi dirûşmeya Jin Jîyan Azadî ji hemû cîhanê ra bûye mînak bi hêza jinan li ser pêyan e.

Dema ku şoreşa Rojava hate lidarxistin bi hezaran jin û jinên ciwan xwe bi sîleh rakirin û ji bo parastina şoreşê û axa xwe, di nav refên şoreşê da cih girtin.

Vê şoreşê gelekî destkeftin derxistin holê. Ji ber ku pergalên desthiladar ên kapîtalîst, paşverû yên ku li ser kolekirina jinê hatibûn avakirin denga jinan dibirîn û di nav çar dîwaran da ew dorpêç dikirin. Her tim xwe li ser wan ava kirin. Bi hemû rêbazên tundî, kuştin, destdirêjî û HWD. Xwe li ser tunekirina vîn û bedena jinê mezin kirin.

Lê bi saya şoreşa Rojava ya jin careka din derket holê ku ev yek ne çarenûsa jinan e û ev şoreş li hemberî hemû pergalên baviksalar ên kapîtalîst bû berbest. Di hundirê şoreşa Rojava ya ku bi ked û qehremantîya hezaran jinan hate avakirin da gelek sazî hatin avakirin. Vê hişt ku jin qasî di nav refên leşgerî da, di nava refên sazîyên şoreşê da jî xwe bi rêxistin bikin.

YPJê ya ku di yekem salên şoreşê da hate avakirin ji bo xurtbûyîna vîna jinê roleka gelekî girîng lîst. Ji ber vê dikare were gotin YPJê ya ku hêza jinê bi artêşbûyîna xurt kir, yek ji destkeftina herî bingehîn a jinan e. Bi hezaran jinên ku heta wê demê di nav çar dîwaran da ji rastî, dîrok û nasnameya xwe hatibûn dûrxistin bi serî hildana li hemberî vê, di nav refên YPJê da rêxistin bûn. Di nav şoreşê da hêza yekem a jinê bi artêşbûyîna jinê derket. Jinan qasî ku parastina axa xwe kirin, li hemberî pergala mêtingehkar, faşîst û serdestîya mêr şer kirin.

Jinan qasî ku di qada leşkerî da cih girtin, di qada avakirina qada civakî da jî cih girtin. Bi rêya sazîbûn rêxistinbûna jinan xwedî cihekî girîng e. Mala Jin a ku ji bo parastina mafên jinê têdikoşe û birêxistin dibe xwedî cihekî girîng e. Di heman demê da avakirina asayîşa jin, HPC-Jin û bi dehan rêxistin û sazîyên jin ji bo bidestxistina azadîya jinê hatin avakirin.

Bêguman divê di ev dîroka pîroz a şoreşê da rola girîng jinên komunîst baş were fêmkirin. Jinên gerîla yên komunîst ku hîna di yekem rojên şoreşê da derbasî Rojava bûn ji destpêkê heta niha roleka sereke lîstin. Jinên komunîst hîna di wê dîrokê da bi dirûşmeya 'şoreşa Rojava ya Jin Şoreşa me ye' derbasî Rojava bûn. Ji qada leşgerî heta pêvajoya avakirina artêşa jin a YPJê, heta TEV-DEM, Kongra Star, ji qada tendurîstî, weqfên jin, asayîş, şaredarî, ragihandinê heta komîn, meclîsên xweser ên jin û gîştî bûn xwedî kedeka mezin in. Bi pêşengtîya komunîstan di sala 2015an da Sazîya Yekîtî û Piştgirîya Gelan (SYPG) hate avakirin. Bêguman jinên komunîst di rêxistinkirina bingeha SYPG û heta îro di meşandina kar û xebata wê da bûn kevirê teneşîrê. Di sala 2015an da ji bo meşandina xebatên civakî û avakirina şoreşa jinê, SYPG-Jin hate avakirin. Armanca avakirina SYPG-Jin bi taybetî di nava refên SYPGê da rêxistinkirina sîstema jinê bû. Her wiha piştî avakirina SYPGê di dîroka 2017an da rêxistina Jinên Azad ên Sosyalîst (JAS) hate avakirin. SYPGê jin rola avakirina bingeha JASê lîst.

Divê demê de gelo me çima bi taybetî got azadî û sosyalîzm. Ji ber ku em azadîyeka bê sosyalîzm naxwazin. Azadî bi sosyalîzm û komunîzmê ve hevdu temam dike. Di vî warî da armanca jinên sosyalîst û komunîst gav avêtina ji bo sosyalîzmê ye. Ji bo ku mafên jinê yên ku bi rêya şoreşa demokratîk hatine bidestxistin encax bi rêya sosyalîzm û komunîzmê dikarin werin misogerkirin.

Her wiha di dîroka 2019an da rêxistina Jinên Komunîst ên Şoreşger (JKŞ) hate avakirin. JKŞê jî bingeha xwe ji JAS digire. Ji bo rêxistinkirina girseyên jinan gelek hemle da meşandin. JKŞê êdî hemû kar û xebatên xwe li ser pergala xwe ya komîte, meclîs, kordînasyon û hwd. bi awayekî nîzamî rêxistin dike. JKŞê rêxistina jinên komunîst a xweser e. JKŞê di kar û xebatên xwe da heta niha gelekî destkeftî bidestxistin. Di dîroka xebatên jinên komunîst da bi taybet rêxistinkirina sempozyûm, komxebat, civîn û şahîyên jinê yên berfireh, hemleyên wekî "derîyên malên xwe ji şoreşê ra vekin" , "Berxwedana Li Dijî Tundîyê, Berxwedana Li Dijî Dagirkerîyê ye" , "Keda Hundirê Malê ya Jinê Hêja ye" , "Keda Jinê ya Hundirê Malê Keda Civakî ye" û HWD. meşandîye. Jinên Komunîst bi taybet bi hemleya "Keda Hundirê Malê ya Jinê Keda Civakî ye" bal kişand ser keda jinê ya ku nayê dîtin an jî biçûk dihê dîtin.

Hêza wê hemleyê bingeha JKŞê mezin kir. JKŞê hemû hêza xwe da ku derbasî hundir malan bibe û jinan ji malan derxe û tevlî jîyana civakî bike. Ta ku karibe zincîrên serdestîya mêr bide şkenandin. Niha yek ji xebatên JKŞê hemleya Jiyana azad û wekhev e. Gelo jîyana azad û wekhev çi ye? Jîyana azad şkenandina nîra mêtingehkarî û kapîtalîzmê ya li ser zayenda jin û tevahî beşên civakê ye. Wekhevî jî ji di navbera zayendên jin, mêr û zayendên din ên bindest da û di navbera netew, gel û tebeqetên hemû civakê da dabînkirina wekhevîyê ye. Yek ji bingeha azadî û wekhevîya civakî ya herî esas jî wekhevîya navbera zayendan e. Ji ber ku bingeha tevahî pergalên dewletên kapîtalîst li ser koletîya jinê ava kirîye. Yek ji mijarên sereke yên di rojeva têkoşîna jinên komunîst da ev e.

Jinên Komunîst ên Şoreşger li ser bingeha dîrokeka kûr têdikoşin. Ji dayikên Şemîyê heta serdema serhildanan, jinên komunîst li dijî dewleta Tirk a mêtingehkar li ber xwe didin. Hem di têkoşîna çînan da, hem jî di têkoşîna azadîyê ya neteweyên bindest da bûne şervanên fidayî ên pêşengên komunîst.

Weke Jinên Komunîst ên Şoreşger, em hêza xwe ji dîroka 30 salî ya pêşengê komunîst digirin, ku her kêliya wê bi sonda têkoşîn û serkeftinê derbas dibe. Em ê li çar parçeyên Kurdistanê li dijî kapîtalîzm, serdestîya mêr û dagirkerîyê li ber xwe bidin.

DI ŞOREŞA KUBAYÊ DA JIN

Di sala 1959an da li Kubaya ku li parzemîna Emerîkayê ye, şoreşeka demokratîk a gelêrî pêk hat. Bi piştgirîya şerê gerîla û girseyên gundî, karker, kedkar û jinan, hikûmetekî gelparêz hat avakirin. Beşek ji jinan weke kadroyên pêşeng di şoreşê da roleka girîng lîstin.

Di bin serokatîya Fîdel Castro da li dijî dîktatorîya hevkarê Dewletên Yekbûyî yên Emerîkayê (DYE) Batîsta (Batîsta di sala 1952an da darbeya leşkerî pêk anîbû) têkoşîneka şoreşgerî hate destpêkirin. Li alîyekî li gundan, bajaran û di nava xwendekarên zanîngehan da xebata rêxistinkirin, têkoşîn û li alîyê din jî şerê gerîla dan dest pê kirin. Jinan di vê têkoşînê da li hemû qadan, di refên herî pêş da cih girtin. Navên pêşîn ên ku dihên bîra mirov Celia Sanchez, Melba Hernandez, Haydee Santamaria, Vilma Espin, Delsa Esther, Puebla Viltres (General Tete). Her wiha ev rastîyeka ku gelek jinên nenas û bênav hene ku rasterast an jî nerasterast alîkarîya pêvajoya şoreşê kirine.

Vê tevgerê ji bo ku çekên xwe ji artêşa Kubayê bigire û karibe şerê gerîla bide destpêkirin, di dîroka 26ê Tîrmeha 1953an da êrîşî baregeha Moncada kir. Çalakî bi ser neket, piranîya şervanan bi şkenceyan hatin qetilkirin, hinek hatin girtin, ji wan kêm kes jî sax man. Piştre navê vê tevgerê bû tevgera 26ê Tîrmehê. Fîdel Castro jî di nav da, kesên ku di girtîgehê da bi efûya giştî hatin berdan. Têkoşîna şoreşgerî gav bi gav mezin bû û di sala 1956an da li Çîyayê Sierra Maestra dîsa dest bi têkoşîna gerîla kirin. Jinan karên dijwar, sereke yên wekî ragihandina di navbera çîya û bajaran da peydakirina lojîstîkê pêk anîn.

Melba Hernandez yek ji pêşengên şoreşê ye. Melba parêzer bû û bi geşedanên sîyasî ra eleqedar bû. Piştî nasîna Fîdel û hevalên wî, ew zû çalak bû. Di hemû pêvajoyên şoreşê da weke kadroyeka pêşeng cih girt. Di sala 1953an da di rêxistinkirina serdagirtina Baregeha Moncado da cih girt û di sala 1956an da jî di hatina gerîlayan a Çîyayê Seirra Maestra da cih girt. Wê ev erk bi dizî û bi serkeftî pêk anîn. Li bajaran xebatên veşartî dimeşîne û di sala 1958an da bi erka çavdêrî û rêxistinê beşdarî enîyên şer dibe. Piştî şoreşê, Melba têkilîyên navneteweyî yên Kubayê wekî dîplomateka jin bi serkeftî bi rê ve bir.

Haydee Santamaria yek ji jinên şoreşger e ku mohra xwe li şoreşa Kubayê xistîye. Haydee kesek ku ji fêrbûn, xwendin, nîqaş, û sazkirinê ra vekirî bû ew û di rêvebirina têkilîyên jîyana îlegal da jîr bû. Di yekemîn komîteya sîyasî ya tevgerê da cih girt. Bû yek ji jinên ku beşdarî rêxistinkirin û çalakîya serdegirtina baregeha Moncada. Di serdegirtinê da birayê wê û dergistîyê wê rastî şkenceyê hatin û hatin qetilkirin. Haydee bi zêdetir hemêzkirina têkoşînê, êşa xwe derman kir. Her çend di yekîneya jinên şervan a Mariana Grajales, ku li Sierra Maestra hate damezrandin, da cih negirtibe jî Haydee di tevgerê da jineka pêşeng a şervan bû. Haydee peywira xwe ya ewlekirina girêdana çîya û bajaran, peydakirina hewcedarîyên lojîstîkê û berdewamkirina dîplomasîya tevgerê bi cih anî.

Piştî şoreşê bi navê "La Casa da Las Americas" maleke çandê ya bi statuya komeleyê hat avakirin û Haydee Santamaria serokatîya vê sazîyê kir.

Vîlma Espin dema beşa endezyarîya kîmyayê dixwend bi mijarên sîyasî ra eleqedar bû. Piştî ku zanîngeh qedand, tevlî tevgera 26ê Tîrmehê bû. Di rêxistinkirin û koryetîyê da cih girt. Dema ku şerê gerîla li Sierra Maestra dest pê dike, Vîlma yek lingê xwe li çîya ye. Di vê heyamê da, Vîlma di komîteya sîyasî da bû. Demek berîya serkeftina şoreşê li herêma enîya 2emîn a Rojhilat erkdar bû û erka rêxistinkirina piştgirî û xurtkirina enîya paş a şerê gerîla bi cih anî. Piştî serkeftina şoreşê, Vîlma, tevî gelek peywirên din, bi salan serokatîya Federasyona Jinan a Kubayê ku di sala 1960î da hat avakirin, kir.

Celia Sanchez seroka jin a şoreşger e ku bi şerkerî, rêxistinbûn, biryardarî û keda xwe ya bêwestan îlham da şoreşger û gelê Kubayê. Celîa jina yekem bû ku li çîya beşdarê pêvçûnan bibû. Dem bi dem diçe bajaran û li wir kar û xebat dimeşîne. Di sala 1957an da bi temamî bû kadroya çîya, li çîya her cure berpirsîyartî rakir. Ew bû hevalê kar ê herî nêzîk ê Fidel. Wê piranîya karê rêveberîyê girt ser xwe, wekî kesê duyemîn di zincîra fermandarîyê da dihê dîtin. Ji bo avakirina Tûgaya jinan a ku di 4ê Îlona 1958an da hate avakirin, kedeka mezin da. Her wiha hêza çareserîya pirsgirêkên gundîyên li qadên gerîla jî bû. Piştî ku şoreş bi ser ket, Celia Sanchez bû cîgira Fidel Castro û di avakirina qada leşkerî û civakî da erkên mezin girt ser xwe.

Delsa Esther Puebla Viltres (General Tete) di nav Kubayîyan da wekî Tete dihat naskirin. Jineka wêrek bû ku di temenê xwe yê ciwan da tevlî refên têkoşînê bû. Dema ku tûgaya jinan a Marîna Grajales hate avakirin bû cîgira fermandarîya tûgayê. Piranîya gerîlayên mêr li dijî avakirina tabûra jinan sekinîn. Difikirîn ku jin nikarin şer bikin. General Tete jî di nav da gerîlayên jin bi cesareteka mezin şer kirin. Piştî şoreşê jî Tete ji bilî erkên leşkerî gelek erk girt ser xwe. Di sala 1994an da pileya serhengî-mîralaytî û piştî du salan di sala 1996an da jî pileya lîwayê hat dayîn Tete. Piştî vê şunda navê wê bû General Tete.

Piştî şoreşê di sala 1960î da Federasyona Jinan a Kubayê hat damezrandin. Jinan gelek maf û destkeftî bi dest xistin. Piştî şoreşê hemleya perwerdehîyê hat dest pê kirin. Ji bo ku jin karibin fêrî karên nû bibin û karibin bibin xwedî kar, proje hatin pêşxistin. Bi zagona Kuba ya malbatê ya ku di sala 1975an da hate derxistin, hate mecbûrîkirin ku di rewşên ku jin dixebitin da rola mêr di karê malê û xwedîkirina zarokan da hebe. Pîşeya xizmetkarîya malê ya ku bi giranî jin tê da dixebitîn, hate rakirin. Di encama van hemûyan da piranîya kesên ketine zanîngehê jin bûn. Îro li Kubayê ji sedî 65ê xebatkarên teknîkî û ji sedî 60ê bijîşkan jin in. Weke gelek şoreşan, di şoreşa Kubayê da jî gelek jinan cih girtin.

Jinan bi kedeka mezin şoreş mezinkirin û xwe di nava şoreşê da ji nû ve afirandin. Ev ji bo jinan şoreşeka di nav şoreşê da bû. Jin hîna zêdetir beşdarî têkoşîna şoreşgerî ya rizgarîya civakî bûn. Lê belê di têkoşînê da hişmendîya wan a zayendî jî pêş ket û ji bo azadîya zayenda xwe têkoşîyan.

Ji Rojava Heta Rojhilat Jin Jîyan Azadî

Di 16ê Îlona 2022an da li Rojhilata Kurdistanê jineka ciwan a bi navê Jîna Emînî hat qetilkirin. Piştî qetilkirina wê, serhildaneka mezin destpê kir. Bandora vê serhildana mezin hîna jî berdewam e. Di salvegera duyemîn a serhildanê da me bi yek ji nûnerên JKŞê Xanim Îbrahîm û endama JKŞê Leyla Kobanê ra sohbet kir.

-Hûn bi xêr hatin. Weke ku hûn dizanin, du sal berê li Rojhilata Kurdistanê serhildanek dest pê kir. Jineka ciwan a Kurd ji ber ku porê wê xuya bû ji alîyê polîsên exlaqî ve hat binçavkirin. Jîna Emînî ya ku di girtîgehê da rastî şkenceyê hat, piştî hefteyekê di nexweşxaneyê da jîyana xwe ji dest da. Ji wê rojê û pê ve, destpêkê li Rojhilat, li Belûcya û tevahîya Îranê bi pêşengtîya jinan serhildanek dest pê kir. Hûn dixwazin çi bibêjin? Çima ev serhildan serhildana 'Jin Jîyan Azadî' bû?

Xanim: Serhildana "Jin Jîyan Azadî" li Rojhilata Kurdistanê destpê kir û li hemû cîhanê belav bû. Di vê serhildanê da gelek kesan jîyana xwe ji dest dan. Di sala duyemîn a serhildanê da ez wan bi rêzdarî bi bir tînim. Bi hezaran kesên ku beşdarî vê serhildanê bûne ji alî rejîma Îranê ve hatin binçavkirin û hatin xistin zindanan. Ew rastî şkenceyên giran hatin, bindestkirin, hinek kes hatin revandin. Dadgehên Îranê îro jî hewl dide ku bi zordestî, bi cezayên darvekirinê berxwedanê bisekinîne. Weke Jinên Şoreşger ên Komunîst, em ev berxwedana li dijî rejîma Melelî ya paşverû ya Îranê silav dikin. Em careka din hezkirina xwe ji girtîyên jin ên şoreşger ra radigihînin.16ê Îlonê bêguman rojeka dîrokî ye. Dema hat bihîstin ku Jîna Emînî hatîye qetilkirin, pêşî li ber nexweşxaneya Kasra ya Tehranê çalakîyek çêbû. Piştî rojekê malbata wê cenazeyê Jîna anîn Seqezê. Bi sedan kes li goristana Eyçîyê kom bûn. Jîna Emînî bi tililî û dirûşmeya Jin Jîyan Azadî hat oxirkirin. Dibe ku jineka ciwan li vir hatibe definkirin. Lê li heman axê hêvîyek ji hemû jinên cîhanê ra derket holê û mezin bû. Ji ber vê yekê ev serhildan bi navê serhildana 'Jin Jîyan Azadî' hat naskirin.

Leyla: Li Îranê azadîya jinan ji alîyê rejîma Melelî ve hat desteserkirin. Rejîma Melelî pergaleka paşverû ye. Jina Emînî jî jineka Kurd bû. Ev yek bandoreka pir girîng li ser polîsên exlaqê yên ku şkence li wê dikin heye. Dewleta Îranê dewleteka înkarker e ku gelek gelên wek Kurd û Belûc îstîsmar dike ye. Ji ber vê yekê kuştina Jîna Emînî bi lez û bez ji bo hemû gelên bindest, bû banga serhildanê. Dibe ku dewletên mêtingehkar Kurdistan parçe bikin û sînoran danîne navbera me. Lê agahîya me ji zilma li ser jinan a ji alîyê rejîma Îranê ve hebû. Li ser navê Îslamê cil û bergên bi darê zorê, cezayê revandin û kuştinê, rêbazên şkenceyê û hwd. Lê her ku zextek li derekê hebe, di berdêla wê da berxwedan ew qas mezin dibe. Serhildana Jîna Emînî careka din ev yek nîşan da. Vê serhildanê hemû cîhan hejand. Ji her alî ve mirov tevlî serhildanê bûn. Hunermend, werzîşvan,akademîsyen, parêzer, mamoste, kedkarên jin ên malê, karker. Her wiha Kurd, Azerî, Belûc, Fars...

-Em dixwazin vê xalê tam bigirin dest. Bi rastî dema em lê dinêrin kesên ji gelek beşên civakê ev serhildan anîn ziman û tevlîbûn. Em di hundir da, hem jî derve beşdarbûna vê serhildanê hebû. Kolan bi jinên ku porê xwe vedikin an dibirin tijî bûn. Di vê serhildanê da jin çawa rêxistinbûn? Di kîjan çalakîyan da gihaştin hev?

Xanim: Bêguman ji ber bûyerekê serhildan çênabe. An jî gel wê di rojekê da ji serhildanê ra amade nebe. Têkoşîna şoreşgerî ya li dijî dewleta Îranê ev demeka dirêj e hem li herêma Kurdistanê û hem jî li welatên Belûcyayê berdewam e. Jin bi salane li dijî vê zordestîyê li ber xwe didin. Lê elbet rêxistinên ku berî serhildanê hatine avakirin û şêweya rêxistinbûna wan di dema serhildanê da ji hev cuda ne.

Piştî derketina holê ya hatin qetilkirina Jîna Emînî, medyaya civakî bûye amûrekî çalak ê rêxistinbûnê. Bangên çalakî û çalakîyên ku pêk hatin, bi rêya medyaya civakî li seranserî cîhanê belav bûn. Çalakîyên bi vî rengî bi awayekî girseyî pêk hatin. Jin bi şev û roj li ber agirên ku li kolanan dişewitîn kom bûn û bi avêtina hîcabên xwe protesto kirin. Bi vê şêwazê çalakîyê dewleta Îranê gelek caran rastî êrîşan hat. Di heman demê da çalakîyên birîna porê xwe ya jinan li hemû cîhanê belav bû. Ev dihê wateya çalakîyeka mezin. Parêzeran ji bo kesên ku di çalakîyê da hatin revandin an jî hatin binçavkirin enîyeka mafê mirovan ava kirin. Xebatkarên tenduristîyê jî kesên di çalakîyê da birîndar bûne derman kirin. Her wiha destnîşan kirin ku ji bo îspatkirina şkence û qetlîaman rapor di girtîgehê da ne. Rola rojnamegeran pir mezin bû. Ji roja yekem ve ji bo belavkirina nûçeyan hewildaneka awarte dan. Ji ber vê yekê îro cezayê darvekirinê li rojnamevanan dihê birîn. Bêguman rola hunermendan nayê ji bîr kirin. Strana 'Baraye' ya ku ji alîyê hunermend Şêrvîn Hacîpûr ve hatîye çêkirin, gelekî navdar e. Ev strana ku dilê herkesî da cih girtîye, li qadan ji alîyê hezaran kesî ve hatîye gotin.

Leyla: Em her tim behsa girîngîya rêxistinbûna jinan dikin. Medyaya civakî amûrekî pir girîng e ku ji bo armanceka rast were bikaranîn. Di heman demê da, girîng e ku serhildanê yekem car li ku dest pê kir, Rojhilat bi dehan salane ji alîyê dewleta Îranê ve hatîye dagirkirin. Li Belûcya jî wisa ye. Serhildan bi lez belav bû. Li vir gel li dijî mêtingehkarîyê li ber xwe dide û rêxistinbûn heye. Serhildan pêşî di nav xwendekaran da belav bû. Li bajarê Babûl da zanîngeha Noşirevanî da xwendekar ji bo Jîna derketin qadan.

-Gelek spas, hûn dixwazin herî dawî çi bibêjin?

Xanim: Jinên cîhanê ji vê serhildanê fêrî gelekî tiştî bûn. Berîya her tiştî me dît ku divê em rêxistinên parastina çekdar ava bikin. Em nikarin bêyî têkoşîna çekdarî dewletên kapîtalîst emperyalîst ên serdestîya mêr tune bikin. JKS'ê banga avakirina rêxistinên parastina çekdarî yên jinan dike. Îro em careka din silavên xwe ji hemû jin û rêhevalên şoreşger ên ku li dijî êrîşên darvekirinê yên dewleta Îranê li ber xwe didin ra dişînin. Ji Rojava heta Rojhilat, ji Surî heta Îranê em dîsa bang dikin: Jin Jiyan Azadî.

Bangewazîya ‘No Pasaran-Rê Nede’ Ya Dolares Ibárruri

Hinek gotin hene ku mohra xwe li heyameka dîyar a dîrokê xistine. Dema kengî ew gotin were guhê mirov, mirov wê heyamê û rola ku di wê heyamê da lîstîye teva xwedîyê wê gotinê tîne bîra xwe. Ev e “Gelê Îspanyayê! Jinno ger sîlehên we tunebin bi kêrên xwe, bi zeyta sorkirî şer bikin! Li ser pêyan mirin, ji mirina li ser çonkan başitir e. NO PASARAN! (Rê Nede) yek ji van gotinan e. Dê Dolores Ibárrurî bi ev gotina xwe ya ku serî natewîne û sekna xwe di dil û mêjîya jinên cîhanê da bijî û dê bûyîna xêza berxwedanê berdewam bike.

Gelo xwedîya ev gotinên milîtan Dolores Ibárrurî kî ye?

Navê wê yê rastî Isidora İbárruri Gómez e. Dolores İbárruri, li herêma Baskê ya Îspanyayê weke zaroka malbeteka xizan a kanzavan welidî. Ji 11 zarokan weke zaroka 8emîn di Kanûna 1895an da ji dayik bû. Hîna di temenê xwe yê gelekî biçûk da jêhatîbûna wê dihat fêmkirin. Rexmê ku yek ji şagirtên ku mamosteyê wê dixwest ew bihê şandin dibistana taybet, ji ber bêderfetîyên aborî malbatê nikarî wê bişîne dibistanê. Şerê jîyanê wekî hemû zarokên xizan ji bo Doloresê jî zû destpê kir. Ji masîvanîyê heta suxrevanîyê-xizmetkarî, heta dirûnkerî û febrîqeyan di gelek karan da xebitî. Karkerbûna wê ya di emrê zaroktî da hişmendîya wê ya çînî pêş xist. Di nava xizanî, birçîtî û nexweşîyan da newekhevîtî û bêedeletîya navbera çînan hîna başitir dît. Di sala 1917an da bi Julián Ruiz Gabinayê ku karkerê kanzayê bû ve zewicî. Hevalê wê yê jîyanê Julîan di heman demê da bû hevalê wê yê şer. Bi bandora ji her tim ji ber xebatên xwe yên polîtîk hatin girtina hevjînê xwe, mecbûr ma ku Dolores her tim bi xwe li ser pêyên xwe bisekine. Ji ber xizanîyê gelek zarokan jîyana xwe ji dest da. Zarokên Dolores û Julîan jî ji ber ku dê û bavên wan gelek caran hatin girtin bi mehan li kolanan jiyîn.

Dolores di sala 1917an da bû endamê Partîyê Karkeran ê Sosyalîst. Piştî şoreşa cotmehê, dest bi xwendina pirtûkên Marks, Encilos kir. Ev yek ji wê ra bû “şibakeya ku ji jîyanê ra vedibe”. Êdî wê dikarîbû ku hişmendîya xwe ya çînî bi awayekî zanistî şirove bike. Sedema bêmafîyên di jîyanê da zanîbû. Û ew bawer bû ku dê rizgarî di bin ronahîya Marksîzmê da, bi şoreşa sosyalîst gengaz bibe.

Doloresê di jîyana xwe da, bixwe tecrûbe kir ku xizantî çawa bandor li jinan dike. Ew şoreşgereka hem ji çîna bindest, hem jî şoreşgereka ji zayenda bindest bû. Bi bengînî bawer kir ku rizgarîya jinan di sosyalîzmê da ye. Teva jinan, di têkoşîna ku li dijî faşîzmê hatîye dayîn da di refên herî pêş da cih girt. “Encûmena Jin a Navneteweyî ya li Dijî Faşîzm û Şer” ku Ibárrurî rêbera wê bû di berxwedana li dijî faşîzmê xwedî cihekî jîyanî bû. Rojnameyên jinên komunîst ên bi navê Companera (hevrê) û Mujeres de Madrîd (Jinên Madrîdê) ji alîyê vê encûmenê ve hatin weşandin. Di têkoşînê da, di komîteyan da zêdetirî sed hezar jin cih girtin û di berxwedana jinê da bûn mînakên girîng ên dîrokê. Di berxwedanê di ji avakirina berbesbestan-barîkatan heta avakirina stasyonên hawarî, ji xebitîna di santralên têlofonan heta febrîqeyan di hemû xebatên jîyanî da jin xebitîbûn, Madrîd bûbû bajarekî azad ku ji alîyê jinan ve dihat bi rê ve birin.

Şerê navxweyî yê Îspanyayê di navbera faşîst û şoreşgeran da pêk hat. Dema ku wê di kêlîya vî şerî da di refên herî pêş da cih digirt, ev gotinên wê li kolanên Madrîdê di zimanê berxedaran da bû dirûşme: No Pasaran! (Rê Nede). Di salên 1920an da, ew yek ji endam û rêberên partîyê Komunîst ê Îspanyê ye. Ibárrurî piştî ku di sala 1933an da, weke parlamenter ji parlamentoyê ra hat hilbijartin, bi cihê jinê yê di nava civakê da eleqeder bû, ji bo maf û başkirina şertên jîyana jinan xebat meşandin. Di sala 1930î da yekem jina ku ji bo Komîteya Navendî ya Partîya Komunîst ê Îspanyayê ra hatibû hilbijartin. Di sala 1934an da jî weke nûner tevlî Kongreya Jinên Cîhanê ya li Parîsê bû.

Di salên 1936an da, axaftinên wê beşeka mezin ji ya civakê û bi taybetî jî jin di nav têkoşîna antîfaşîst da anî gel hev. Di heman heyamê da, di bîsta şerê navxweyî da tabûrên enternasyonal hatin Îspanyayê. Dolores tabûrên enternasyonal wiha vedibêje: “Her tiştên xwe dan. Komunîst, sosyalîst, anarşîstên xwedî bîrdozî, ol, çermên cuda ku xwedî nêrîna azadî û edaletê bûn ji bo bêşert tevlîbûna têkoşîna me hatibûn vir. Her tiştên xwe dan me, ciwantîya xwe, kemilîbûna xwe, agahî, tecrûbe, xwîn, jîyan, hêvî û daxwazên xwe, her tiştên xwe dan me û ji me tiştek nexwestin. Wan xwest ku cih di nav têkoşînê da bigirin û ji bo me, ji bo rûmeta mirinê bûn dildar.”

Dolores û hevrêyên xwe di alîyekî da li cepheyan li dijî faşîstan şerkirin, lê di alîyekî da jî di hundir da rastî êrîşan hatin. Troçkîst li dijî Stalînê ku rêberê sovyetan û fermandarê şerê parvekirina emperyalîst ê 2emîn bûn. Di şerê navxweyî yê Îspanyayê da Troçkîst zivirîbûn sixûrên gêstapoya Almanî ya faşîst. Derket holê ku çalakîyên şoreşgeran sabote dikin. Li dijî vê ji bo paqijkirina sixurên hundirîn jî, dirûşmeya “Rê Nede” esas girt û di parastinê da dîsa di refên herî pêş da cih girt.

Piştî sê salên dijwar hêzên faşîst ên netewparêz ketin Îspanyayê. Piştî ketina Madrîdê Dolores Ibárrurîyê li Yekîtîya Komarên Sosyalîst ên Sovyetan îltîca kir. Dolores Ibárrurî zarokên xwe jî weke milîtanên şerê sosyalîzmê pêş xistin. Lawê wê yê bi navê Rûben Ruîz tevlî artêşa sor bû di şerê Stalîngradê da dema ku li dijî faşîzmê şer dikir şehîd ket. Dolores jineka milîtan û pêşeng bû û di heman demê da bû dayika şehîd. Ibárrurî û jinên hevrê tena ne ji bo Îspanyayê, bûn sembola têkoşîna li dijî faşîzmê ya hemû cîhanê. Jinên ku bi sekna li dijî faşîzm û serdestîya mêr ji dîrokê heta îro roja me ronî kirin, her wiha me fêrî mezinkirina têkoşînê dikin. Şoreşa Rojava di bin dorpêçê da li ber xwe dide. Li Qadên Parastina Medyayê gerîla ji bo Kurdistaneka azad li ber xwe dide. Dolores wekî me jineka di nav me da bû. Doloresê di têkoşîna li dijî faşîzmê da rê nîşanî me da. Em weke Jinên Komunîst ên Şoreşger soza mezinkirina têkoşîna wan dubara dikin. Li Îspanyayê an jî Rojava li dijî faşîzm û serdestîya mêr NO PASARAN (RÊ NEDE)!

Ciwan Pêşeroj e Pêşeroj Sosyalîzm e

Gelo çima pêşeroja ciwanan û jinên ciwan bi sosyalîzmê ve girêdayî ye? Di serî da hemû jinên ciwan pêwîst e bizanibin ku çi rêbaz li ser wan dihê meşandin û di hundirê pergala kapîtalîst da rastî çi kiryaran dihên. Ev ji bo girtina bersiva vê pirsê mijareka girîng e ku divê baş bihê naskirin.

Yekem pergala kapîtalîzmê bingeha xwe li ser tunekirina bedena jinê ava dike. Malbat yek ji vê bingehê ye. Jinên ciwan beyî ku rastîya xwe û rastîya jîyan û civakê nas bikin bi hatin zewicandina di temenê biçûk da dihên xistin nîra pergala kapîtalîst a serdestîya mêr. Jin bi hemû rê û rêbazên kevneşopî dihê xistin navbera dîwaran. Ew dîwar û kevneşopîyên civakî, rolên civakî yên zayendparêz, xwedîkirina zarokan, xizmetê mêr û malê weke çarenûsa jinê dihê fêrkirin. Bi vî awayî dengê jinê dihê birîn. Lêdan, tundî, tacîz, destdirêjî weke çarenûsa jinê dihê girtin dest. Hemû pergal, binesazîya civakê, pergala perwerde, hiqûq aborî, çandî û hwd. li gorî vê sîyasetê dihê avakirin. Rolên civakî, jîyana civakî, pîşe, sîyaset hemû li gorî vê dihên parvekirin. Yanê di jîyana civakî da ji jêr da heta jor her tişt li ser bingeha koletîya jinê û serdestîya mêr dihê avakirin. Bedena jinê weke meta-kalêr dihê girtin dest û dihê zivirandin biresereka pergala kapîtalîst a serdestîya mêr. Hewl didin ku hemû jinên ciwan têgîna azadîyê li gorî zanebûna kapîtalîst fêm bikin û li gorî vê bijîn. Dixwaze ku jinên ciwan li ser qebûlkirina tundî, kuştin, tacîz, tecawiz û hwd. perwerde bike ku hemû jinên ciwan li ser vê esasî mezin bibin û tirsek di dilê wan da were çandin. Jinên ciwan ên ku rastî kiryarên sîstema serdestîya mêr dihên û mecbûrî vê qebûl dikin bêvîn dimînin. Bi dehan jin bi taybetî jî jinên ciwan ji ber kevneşopîyên civakî dihên kuştin.

Rastîya ku dewletên kapîtalîst fêrî wan kirîye asta qebûlkirina tundîyê ye. Divê bihê zanîn ku koletîya ku ji dîroka bi hezar salane li ser jinê dihê ferzkirin derketina holê ya milkê taybet û di destê mêr da kombûna milkê taybet e. Ji ber vê yekê mijara milkê taybet ji bo têkoşîna me mijara sereke ye. Ji ber ku di serî da mêr hem bi dest danîna ser milkê taybet serdestîya xwe ya civakê û hundirê malê ava dike, di alîyê din da jî bedena jinê weke milkê xwe qebûl dike. Ev dihê wê wateya ku jin tena weke amûrekî afirandina zarokan dihên dîtin. Û mêr li ser zayokîya jinê binyata xwe berdewam dike. Ev di pergala kapîtalîst da dihê wateya berdewamîya serdestîya mêr û pergala kapîtalîzmê. Bi taybet ev sîyaset hîna di temenê biçûk an jî zaroktî da dihê danîn ber jinan. Ji ber vê zewaca di temenê biçûk da, bi taybetî li ser jinên ciwan dihê ferzkirin. Ji bo wê jî êdî mijara berdana jinan zêde bûye. Niha li Iraqê jî dixwazin ku zagona malbat û zewacê biguherin û temenê zewacê daxin 9 sal.

Weke ku em dibînin hemû pergalên serdestîya mêr li ser tunekirina azadîya jinê dihên avakirin. Bi taybet jinên ciwan ên ku di hundir şoreşa Rojava da dijîn pêwîst e hêzeka mezin ji vê şoreşê bigirin. Ji ber ku di serî da ev şoreş weke şoreşa jin dihê bi nav kirin. Ên ku pêşengtîya vê şoreşê kir û li dijî serdestîya mêr şerkirin, xwe di nav rêxistinên vê şoreşê da bi cih kirin jin bûn. Hêza yekem a ku li dijî çeteyên DAÎŞê şer kir û ew bin xistin artêşa jin YPJê bû. Di hundirê şoreşa demokratîk da yên ku pêşengtîya vê şoreşê kirin jinên ciwan bûn. Ji bo vê yekê jî em çarenûsa rizgarîya jinên ciwan û hemû jinan bi sosyalîzmê ve girê didin. Ji ber ku şoreşa sosyalîst di gava xwe ya yekem da bi hilweşandina pergala kapîtalîst a milkê taybet nîra serdestîya mêr a li ser bedena jinê dişkîne.

Hemû gavên xwe yên piştî wê jî li gorî vê esasê davêje. Ji ber vê yekê pêwîst e ku tevahî jin û bi taybetî jinên ciwan di nav refên partîyê komunîst da cih bigirin û bi rêya rêxistina jinên komunîst têkoşîna şoreşa sosyalîst bidin. Ev hêza jinên ciwan dê vê şoreşê ber bi sosyalîzmê ve bibe .

Em çima welatekî azad û sosyalîst dixwazin? Niha em dibînin ku sîstema kapîtalîst di hemû cîhanê da xwe xurtir dike, di hemû cîhanê da tundîya, kuştin, tacîz, tecawiz, bêkarîya jinan, xizanîya jinê, zewaca di temenê biçûk da, polîgamî (zewaca zêde). Kapîtalîzm nikare jîyana azad û wekhev dabîn bike. Ji ber ku bingeha wê li ser newekhevîtîyê ava kirîye. Dema ku pirsa dê jîyana azad û wekhev çawa were avakirin? were kirin, bêguman bersiva wê pergala sosyalîst û komunîzm e.

Dema ku em azadîya jinê dixwazin, em di heman demê da azadîya civakê jî dixwazin. Ger ku azadîya jinê neyê dabînkirin azadîya civakê jî nayê dabînkirin. Ji ber ku kapîtalîzm hemû civakê jî dike koleya pergala xwe. Wekhevîya di navbera jin û mêr da di heman demê da wekhevîya çînî ye jî. Di sosyalîzma ku pêşengtîya jîyana azad û wekhev bike da, dê bi keda jinên ciwan azadîya jinê were bidestxistin. Serî rakirina li dijî pergalên koledar wê bibe bingeha avakirina sosyalîzmê. Niha jin di tevahî cîhanê da bi dirûşmeya Jin Jîyan Azadî serî hildidin û serdestîya mêr qebûl nakin.

Weke jinên ciwan me di gelek xebatên xwe da xwest em bal bikişînin ser keda jinên ciwan. Jinên ku di hundir şoreşê da bûne sembola ked û bedêldayinê dê şoreşê ser bixin. Yek ji xebata me ya herî bingehîn “Em ê bi keda jinên ciwan dîrokê biafirînin” bû. Em ji ber vê dibêjin pêşeroja me sosyalîzm e. Hêza herî dînamîk a ku sosyalîzmê ava bike jî ciwan û jinên ciwan in. Weke ku ev şoreş bi keda jinên ciwan mezin bû, dê bi keda jinên ciwan jî ser bikeve.

EM ŞENGALÊ JI BÎR NAKIN

JKŞê bi boneya salvegera 74emîn a ku DAÎŞê di sala 2014an da bi hevkarîya dewleta Tirk û PDKê li ser gelê Êzidî pêk anî li Hesekê û Kobanê semîner lidarxistin. Di semînaran da bangewazîya têkoşîn û hesab pirsînê hat kirin.

Jinên Komûnîst ên Şoreşger li Hesekê û Kobanê bi boneya 74emîn salvegera fermana Şengalê perwerde lidar xistin.

Perwerdeya JKKê li bajarê Hesekê li cihê TKŞê hat dayîn. Perwedeya ku bi şêweya semîner hatîye dayîn bi deqek rêzgirtin destpê kir. Di semînerê da li ser navê JKŞê Destan Serhed axivî. Serhed di axaftina xwe da fermana 74emîn a ku DAÎŞê di sala 2014an da li Şengalê pêk anîbû bi bîr xist û axaftina xwe wiha berdewam kir: "Em salvegera fermana74emîn a Şengalê careka din bi bîr tînin. Di dîroka gelê Şengalê da gelek êş heye û pê ra gelek berxwedan û têkoşîn heye. Çeteyên DAÎŞê di şevekê da bi alîkarîya dewleta Tirk a faşîst û hevkarên PDKê ra êrîşa Şengalê kirin. Şengal firotin û komkujîyek li ser gelê Şengalê pêkanîn. Armanca çeteyên DAÎŞa ku di bin navê ol û îslamiyetê da komkujî pêk anî, bi zorê ferzkirina mislimanbûna gelê Êzidî bû. Ji bo qebûlnekirina gelê Şengalê ya vê yekê komkujîyeka bi vî rengî pêkanîn." Destan Serheda ku bal kişand ser şêweya tundîyê got bi sedan mêr hatin kuştin, bi sedan zarok hatin revandin û xwestin ku zarokan li ser fikra DAÎŞê perwerde bikin û jinan parçe bikin."

Serhed anî ser ziman ku dema ku DAÎŞê bi hezaran jinên Êzidî revandin jinên ciwan li alîyekî jinên ciwan û li alîyekî jinên ji temenê 25 salî mezintir bi cih kirine û ji bo firotina wan wêneyên wan tev bahayê wê li ser dîwaran daliqandine, di bazaran da bazirganîya jinên Êzidî kirine." Destan Serheda ku got "feraseta herî qirêj a serdestîya mêr di wê komkujîyê da li ser bedena jinên Êzidî derket holê" bal kişand ser kiryarên serdestîya mêr ên li Rojhilata Navîn û girêdana bi çanda eşîrtî ve". Serhed di berdewamîya axaftina xwe da got "ji ber ev rastîya li Rojhilata Navîn rûmet û şeref li ser vê yekê dihê dîtin û bedena jinê weke rûmet, şeref û exlaq dihê bi nav kirin." Destan Serhed axaftina xwe bi van gotinan berdewam kir: "Dema ku jinên Şengalê rastî vê rewşê hatin ji ber tirsa civakê bi sedan jinan xwe întixar kirin. Ji ber vê hovitîyê tu sûcê wan tunebû ku hesap ji wan bihê xwestin. Niha gelek jinên Êzidî di nav refên YPJê da cih digirin. Bi hezaran jin ji ber feraseta pergalên serdestîya mêr heta îro winda ne û dihên firotin. Lê ev rewş wisa namîne . Wê bi hezaran jin xwe rêxistin bikin û di refên şoreşê da bi cih bibin ku hesabê vê komkujiyê bipirsin."

Serhed di dawîya axaftina xwe de anî ser ziman ku dê fermana 74emîn a ku li ser gelê Şengalê hatîye kirin neyê ji bîr kirin. Dê agirê şoreşa Rojava li cîhanê belav bibe . Dê dirûşmeya Jin Jîyan Azadî pergalên serdestîya mêr hilweşîne. Di dawîya semînera ku piranî jinên Ereb beşdarbûn da belfefîlmekî ku jineka ciwan a Şengalî hesab ji tecawizkarê xwe dixwaze hat pêşkeşkirin. Her wiha semîner bi dirûşmeya "Jin Jîyan Azadî" bi dawî bû.

